Gelo çi bûbû? Gundî, bona gera Şêxo derketin. Bi saetan li Şêxo geriyan. Gelo dê bikaribin Şêxo bibînin? Şêxo hîn dijî? Ya dawîn, wî dîtin, a vay, li wir e. Miriye, mîna qeşayê sar e, çiqas tirsehêz e!
Bona dê û bavê wî çiqas bi şewata dil bû. Şêxo li wir veketî bû. Bi destekî xwe, bi tilîka sêwemîn ya destê xwe yî din girtibû. Bavê wî hema mahna vêya fêm kiribû. Şêxo ji dê û bavê xwe re, bi Xelaskirî qebûl kirina Mesîh Îsa û Şivantî ya wî ya qenc gotibû.
Bavê wî fêm kiribû, Şêxo bêtara berfendeyê dîtiye, lê belê bona revê keysê bi dest ve nexistiye. Paşî fêm kiriye ku wê bimire Îsa Mesîh ê wî, Xelasker ê xwe yî niha jî dê wî tenê nehêle di bîra wî de anîbû. Şêxo vê bêjeyê di bîra xwe de anîbû: "YÊ MIN" û bi tilîka xwe yî sêwemîn girtibû û bernedabû. Ew bi vî avayî hatibû dîtin. Şêxo bi biryarî dizanîbû (Îsa ŞIVANÊ Min e).
Dayik û bavê wî jî qenc dizanîbûn ku: "Şêxo miriye, em wî binerd dikin, lê belê niha ew li buhuştê, li ba Mesîh e." Êşa wan mezin bû, lê belê dizanîbûn ku lawik li ba Mesîh e û bi vêya xemrevînîyê didîtin. Gelo hûn jî gotina: "Xudan ŞIVANÊ Min e" dikarin bibêjin? Hûn bi Îsa Mesîh ve bawer dikin? Wê gavê, em ê TILÎKA SÊWEMÎN DI BÎRA WE DE BÎNIN.

Gotina Xwedê-Încîl ê bixwînin!
Ger Încîl a we tunebe, hûn xwesteka xwe bighînin me, em ê beşek ji Încîl ê, bêyî berdêl ji we re bişînin.
Em ê bi dilxweşî bona bersivdana pirsên we bixebitin.

Navnîşana me ev e:
Hoffnung & Leben e. V.
Postfach 10 13 82
33513 Bielefeld
Germany

Kurdisch

Berfende

Şivanek, li dawa çiyayek bilind rûdine û dest bi lêxistina bilûrê dike.
Li dûra, sîpanên ku bi berfekî bêdawî dibiriqin, xwezayek xweşik!
Rêwiyek li wir betlaneya xwe derbas dike, tê ba şivan.
Bi gotina: "Ji kerema xwe tu dikarî navê xwe bibêje" ji şivan ve dipirse.
Şivan: "Navê min Şêxo ye"
Rêwî: "Gelo tu çend salî yî Şêxo?"
Şêxo: "Deh salî."
Rêwî: "Tu jî dikarî ji min re bibêje Apê Mûsa. Gelo tu li vê bilindahiyê çi dikî?"
"Ji ber ku dibistan betlane ne, ez mîhên bavê xwe diajom."
"Zahf qenc e. Wê gavê tu şivanekî ciwan î. Wê gavê, ka bibêje; tu di derheqê şivanê qenc de çi dizanî?"
"Ez bi xwe şivanek qenc im, ji ber ku baş li mîhên me dinêrim."
"Belê, ez bi te bawerim. Tu bi rastî jî qenc li mîhên xwe dinêrî. Lê belê, ya ku ez dixwazim fêm bikim, nasîn an jî nenasîna te yî Şivanê Qenc î."
"Na! Kî ye ku?"
"Ew Xelaskerê dinê Îsa Mesîh e.
Wî dev ji ezmanan berda, di oxra me û gunehên me de bona ku di xaçê de qurban bibe hate dinê. Lê belê, Xwedê dîsa wî vejand. Niha dîsa li ezmana ye û dijî. Ew Şivanê qenc e.
Ew dixwaze ku mîhên xwe (yanê me) bibe mala Xwedê, cinetê.
Ji nasîna Îsa Mesîh qenctir qet tiştek nîne.
Ew ji nêrîna te yî mîhên te hîn jî qenctir nêrîna te dike."
"Ger ez bimirim, dê min jî bibe mala Xwedê?"
"Ma te qet gunehan kiriye Şêxo?"

“Belê, vê heftê, min bêterbiyetiyekê kir. Wê gavê recê li Îsa Mesîh bike, bona ku vêya û gunehên teyî berî vêya efû bike.”
“Ger tu dua bike û li giştikî mukir bê, ew ê hemû gunehên te, li te biborîne.
Ji ber ku ew, bona wê di xaçê de mir.
Ew, bona berdêla gunehên min û te; û bona sûcên hemû mirovan bide êşê kişand.”
“Apê Mûsa, gelo niha em dikarin hema dua bikin?”
Çi qenc e; giştikî fêm kiribû.
Dixwest ku bi hemû dilê xwe ve bi Îsa Mesîh ve bihata girêdan.
Bi vî avayî, li mêrgê çong şikand û duayek kurt xwend.
Ji kûraniya dilê wî ve dihat.
Bi duayekî ûsa, Mesîh kêfxweş dibû, di eynî demê de Apê Mûsa jî kêfxweş dibû. Ji ber, didît ku Şêxo, bi tûmî bi Xelasker Mesîh ve ewle dibû.
“Niha ez dixwazim, ayetek ku tu qenc di bîra xwe de bînî ji Kitêba Pîroz ve ji te re bixwînim. Gelek kurt e û wusa ye: ‘Xudan şivanê min e.’ Hew ji çar bêjeyî ava dibe.
Bona her tilîkê di destê te de, bêjeyek dikeve.
Li destê xwe binêre, pênc tilîkên te hene ne?
Bi destê xwe yî rastê, bi tilîka seremîn ya çepê bigire û bibêje: . . . . . Xudan
Tilîka şahdeyiyê:. . . . . Şivanê
Û Tilîka navîn: . . . . . Min
Tilîka Gustîlkê:. . . . . E
Tu dibînî Şêxo, çar bêjeyî.
Her kesê ku gunehên xwe ji Îsa Mesîh re bibêje û wî di jiyana xwe de qebûl bike, dikare ûsa bibêje.
‘XUDAN ŞIVANÊ MIN E’
EW (Ne hew Şivan e, ji ber ku hew ew) Şivanek qenc e.
XUDAN, yanê Xudan û Xelasker û Xweda yê ku serdestê her tiştî ye. Hewcedariyên min û te peyde dike û ji te hez dike.
ŞIVANÊ MIN. Tu jî dexlî mîhên wî yî.
E, Ji ber ku ew, îroj, sibê û abedîn mîna xwe ye.
Berî her tiştî, bala xwe bide vê bêjeyê: YÊ MIN.
Xudan Mesîh yê te ye. Bo vê tu dikarî wusa bibêjî: Ew Şivanê MIN e.”
“Apê Mûsa, ger ez vê ayetî bixwînim û di her bêjeyê de, bi tilîkekê bigirim, bi taybetî ez ê tilîka sêwemîn bi zexmî bigirim: YÊ MIN E!
Ji ber ku Xudan Mesîh şivanê min e, ez pirr kêfxweşim.”
Apê Mûsa, yek derban diçû wir û serîkî dida Şêxo. Lê belê, çend hefteyên din, dawiya betlaneya wî hat. Û divê Şêxo jî dîsa biça dibistana xwe.
Êdî zivistan hatibû. Li dawa çiyayan, zivistan, zahf bi talûke derbas dibin. Yek caran talûka berfendê dibe. Berfendeyek, ji gellekî berfê pêk tê.
Bi taybetî di hewayên nerm de ji dawên çiyayan dişemite, ber bi kûraniyan ve digindire. Gellek caran mal xera dibin, mirov dimirin.
Nîvrojek, gava Şêxo bihata malê, bavê wî li benda wî bû. Gava Şêxo hat, bavê wî: “Diya te nexweş e. Doktor reçeteyekê nivîsand. Divê van dermanan hema bên anîn. Ma tu dixwazi hema herî? Tu yê qasî saetekî din li vir be.”
Şêxo mirovek guhdide gotina bû. Hema ber bi dermanxana gundê cînar ve banz da. Çawa dermanan sitend-nesitend, hema bi rêya mala xwe girt. Tarî daketibû. Şêxo, nişkavde dengekî mîna gurmîniya ezmanan bihîst. Lê belê ev denga ne gurmîniya ezmanan, dengê şemitandina berfendê bû. Hema revê fikirî bû, lê belê dereng mabû. Berfende li wî ket û wî di bin berfek di mezinahiya zinarekî de yî hişt. Bavê wî, bêyî sebir li bendê disekinî bû. Ew û gundî gurmîniyê bihîstibûn. Gelo windayiya canê hebû; Şêxo li ku mabû? Telefonî dermanxanê kirin. Lê belê wan jî digotin ku Şêxo dermanan sitendiye û vegeriyaye.